**Die Landesregierung Nordrhein-Westfalen**

29.06.2020 rûpela
1 ji 3yan

Pressestelle
Staatskanzlei 40213
Têlefon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de www.land.nrw

**Danzanîna Çapemenîyê - 525/06/2020**

# Ji alîyê Birêvebirîya eyalete ve sînorkirina derketina derve ya li herêma Warendorfê hat hilanîn / Sînorkirina li herêma Guterslohê hefteyek hat dirêjkirin / Biryarên Fermana Qanûnî ji bo hemûyê Bakurê Ren-Vesfalyayê heta 15ê Temûzê hatin dirêjkirin

## Serekwezîrê Eyaletê Laschet: Li herêma Guterslohê pêdivêya sînorkirinên li ser parastina sihheta herêma Guterslohê dewam dikin

**Herweha Şansolyetîya Eyaletê danzanîna li jêrê belav kiriye:**

Birêvebirîya eyalete, di tarîxa 30yê Hezîrana 2020î ji nîvê şevê ve sînorkirinên derketina derve û kêmkirina jîyana gelêrî ya li herêma Warendorfê hiltîne. Fermanên qanûnî û sînorkirinên li herêma Guterslohê pêkhatî dê heta tarîxa 7ê Temûza 2020î ji bo hefteyekê bên dirêjkirin. Serekwezîrê eyaletê Armin Laschet, Wezîrê Sihetê Karl-Josef Laumann, bi destûrdarên herêmên Gutersloh û Warendorfê Sven-Georg Adenauer û Dr Olaf Gericke re li ser van pêkhatinan di 29ê Hezîrana 2020î de dan û sitandin û li ser vegotinên dû re danxuyandin hatin kirin.
Herweha dê li Bakurê Ren-Vestfalyayê biryarên fermana qanûnî ya bi mebesta parastina ji Koronavayrusê bi dirêjahîya du hefteyan bên dirêjkirin.

Serekwezîrê eyaletê Armin Laschet ev vegotin: “Me bi her tim pêkanîna biryarên li ser hûrgilîya herêmê û pêkhantinên vî çendê han ji şênîyên herêmê pir tişt xwastin. Haya me ji vê heye. Îcar ew ji ber fehmberî û desteka xwe bi temamî mineteke li me kirine. Herweha ev ji bo serekên dezgehên bajarvanîyên herêmî yên em û wan ji bo bidûketin û birêxistina tevgeran têkilîyên ji nêz ve bi hev re kirine jî di rewacê de ye.
“Ji derketina koronavayrusê ve li gora encamên testên bi nêzîkê 40 hezar kesî ve pêkhatî, bipêşveçûnên li ser jimarên bûyeran awayê tevgera ma destek dikin û nîşan didin ku biryarên me yên bi nüans bi heq in. Divên rojên me yên me paşî buhurandin li ser hê devjêneberdana vayrusê tiştin bînin bîra me, em dewam bikin li ser der û dora xwe hişyar bin û hay ji xwe hebin.”

Laschetê birêz weha dewam kir: “Li herêmên Gutersloh û Warendorfêbi dewamkirina tevgerên berpirsîyarê û zelalbûnê re bi dirêjkirina biryaran em ê li van herêman ji bo şênîyên Bakurê Ren-Vestfalyayê ewlehî û texmînkirîyê pêk bînin.”

Wezîrê Sihetê Karl-Josef Laumann ev gotin: “Bipêşveçûnên li herêma Guterslohê me bihîvî dikin. Lêbelê gava em li jimarên heyî dinihêrin em nikarin teqez zanibin ku derbasbûn bi tenê bi derketina sazgeha serjêkirinê ve sînorkirî mane. Digel ku ji bo gelê Guterslohê zehmet be jî, divê em di rojên pêş de ji nêz ve bi dû rewşê bikevin. Ji ber fehmberî û sebra wan mala her kesê li herêmên Guterslohê û Warendorfê ji rewşê bandor dîtine ava be. Sînorkirin teqez hêsan nînin lê ew divên.”

Destûrdarê herêmê Sven-Georg Adenauer vê vegotinê bi lêv kir: “Ez biryarên eyalete yên bi destûrdarên qadê re hevkarî dikin bi temamî destek dikim. Hatiye îsbatkirin ku hemû bergirî û biryarên ji bo herêma Guterslohê sitandî biheq in û divêyabûne. Di çarçoveya vêyana dewamkirina hişyarmayîna me de seranserê hefteyekê dirêjkirina bergirîyan bivênevê ye. Gelek baş e û şênîyên herêmê êdî bi saya encamên testan û nehiştina derbasbûnan bûbin xwedîyên nihêrtinê. Di 7 rojan de 50 derbasbûnên nû ji bo vê xwedanroleke giring e.”

Destûrdarê herêmê Dr Olaf Gericke ev gotin: “Çendîn testên li herêmê kirî nîşan didin ku vayrus negihîştiye tevahîya şênîyan. Ji ber vî awayî ji bo herêma Warendorfê rakirina sînorkirinên derketina derve vêga biryara rast a bi tenê ye. Me di vî çendê nêz de biserketineke lojîstîk bi dest xistiye û di zemanekî kin de kapasîteyên berfireh ên testan pêk anînne. Mala hemû kesên alîkarîyê yên nizanibûn westîn çiye ava. Ji bilî van mala Birêvebirîya eyaletê tevlî etîketnekirina kesên herêmê jî ava.

Serekwezîra eyaletê û şansulye Merkel, ji bo mebestnebûna şênîyên herêmê bi awayekî bê pîrozkirin kar kir. Em vê Hevkarîya wan pîroz dikin.”

Bi gazîkirina ku li dezgeha serjêkirina Rheda-Wiedenbrückê Birêvebirîya eyalete demildest bizivî û dezgehên, xwandingehan û navendên xwedîkirina rojane girtin û di 23yê Hezîrana 2020î de dest bi dewra didoyê ya sînorkirinên derketina derve kir. Di dewama wê de jîyana hemû kesên li herêmên Gutersloh û Warendorfê jî bûn mebesta sînorkirinên bêtirkirî. Bi tenê du kes yan kesên ji heman malbatê/malê ne karibûn di nava xelqê de bên kêleka hev. Ji bilî van digel di seranserê eyaletê de pêkanîna Qaydeyên Xweparastina ji Koronavayrusê gelek cîhên kêfê yên wek muze, sinema, eywanên sporê, birkên sergirtî û baran hatin gitin. Ev fermanên qanûnî hê jî li herêma Guterslohê tên pêkanîn.

Ji bilî sînorkirinên bihevvebûnê û kêfê, di bi awayekî xurt şikestina zincîrên derbasbûnê de pêkanîna bergirîyên kerentîna xuyandî gelek giring e. Ji bilî van birêvebirîya eyaletê bi mebesta pêşbînîya rewşa belavbûna koronavayrusê di nava xelqê de biryar da li herêmên bandordîtî testên koronavayrusê bi berfirehê bên firehkirin. Fersenda hemû şênîyên herêmên Gutersloh ve Warendorfê ji dankirina testa miftî belaş re heye.

***Herweha dibe yek ji vê navnîşana înternetê ya Birêvebirîya eyaletê jî xwe bigihîne vê metna çapemenîyê: www.land.nrw***

***Zanyarîyên bi tevahî yên parastina daneyan***